Lê ev nayê wê wateyê ku wê "Sine" li dijî pirsa Kurdî nesekinin. wê şer, kuştin, û talan li Sûriyê û Iraqê dijwartir bibe, ne ku gurkirina şer nîşana bidawîanînê ye, na gurkirina şer ta ku bighê quxana milet û hikumet pirojeya Emerîka bipejirînin ew jî guhertina nexşeya "Sayîkis Pîko" ye.

Di baweriya min de di qûnaxa pêş de wê Sûriya bikin weltek Fediral û navek nû lê bikin nema navê wê dimînê "Komara Erebiya Sûrî", lê careke dî wê ne dawiya kêşeyê be wê ew jî çend salan dirêj bike. Beriya vê wê Emerîka li hevhatinekê, di navbera Qendîl û Hewlêr de bike û dirêjî Sûrî bike, Meclis û Tev-demê li hev bîne ta ku Ereba razî bike û wê Ereb ji tirsa parçekirina ji hêla "PYD" ve qebûl bikin.

Bi vê lehevhatinê hinek aramî li cem Ereban çêdibe. Lê wê rewş li Kurdistana Iraqê cuda be, dibe ku fediraliyek jî ji bo "Sine" jî bi cî bikin, lê tiştê ku "Sine" nepejirînin petrol li devera "Sina" nîne? Dibe ku dewletek "Sinî di qunaxa duyemîn de çêbike wê ew jî parçek ji Sûrî be û parçek ji Iraqê be. Li vir mesa Îranê diseknînin û li pêşiyê difitilin! Û dive ku Rûsya di ava germ de bimîne, dibe ku Okeraniya ji xwe re bibe. Çimkî pêwestiya Rûsya pir bi xaza Sûrî heye û pêwistiya Emerîka bi Okreaniya heye.

Di baweriya min de yê ku ji vê kêşeyê sûde bike ji her kesî bihtir wê Kurd bin.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Xelîl Xemgîn: 41 Sal in Ku Ez Stranê Dibêjim Hîn Jî Min Negotiye Ez Hunermend im

Hevpeyvîn: Ehmed Bavê Alan

- Nedifikirîm bibim stranbêj, min dixwest kêleka xwe bidim kêleka çiyayan, û bibim şervanek.
- Mihemed Şêxo mîrê min e, ew tişteke pîroz e, newêrim nêzî stranên wî bibim.!
- Hatin û serdana min a rojava, "Nobila" min e.
- Min hemû dîwanên Seydayê Cegerxwîn xwendine û du dîwan jî min ezber kirine bûn "Kî Me Ez?" û "Sewra Azadî.
- 31'yek sal in ku li Elmaniya me, hîc fêrî zimanê Elmanî nebûme!

"Carekê serok Apo ji min pirsî û got: "Di fikra te de Kurd çend melyon in"? Min jê re got Welle serokê min dibêjin di her çar peçeyên Kurdistanê de 40 melyon Kurd hene!. Keniya û got: "Tu dizanî ku ew 40 melyon parçe ne, û tu wek hunermendekî dikarî rihê ewan 40 melyonî bixwe ve girê bidî, û wan 40 melyon parçeyî kêm bikî û bixe parçeyek yan du parçe"!?

Ji ava ku ji kezeba çiyayan diteqe vexwariye, bavê strana dastanî ye, hemû êş û birînên ku di laşê gelê Kurd de derketine, bi dengê xwe derman kirine, ji xizaniya xwe û miletê xwe her û her qîr kiriye, her ku ew stranekê çêdike, dibe dastanek, hemû helbestên bi wate, û ast bilind dike stran, ewî qet jî strana arzan ji xwe re nekiriye kar, her û her şoreşger bû, xwedî armancek taybet bû ji bo pêşxistina hunera Kurdî. Ew bi xwedibêje ku li ser xwesteka birêz Ebdulah Ocalan Serokê "PKK" ewî berê xwe da Ewropayê. Bêtir ji 40 salî ye ku di gastîna strana Kurdî de ye, û hîn jî ji navên mezin e, û gelê Kurd li bendî albumên wî ne, rehetî û bihna çiya ji dengê wî dibare, erê mane ew kurê çiyayê Kurmênc e, erê ew hunermend Xelîl Xemgîn e.

Di vê Hevpeyvînê de werin em ji nêz ve vî hunermendê navdar nas bikin, pêvajoya hunera wî binasin, û ew çawe kete nav kar û liv û baizavê de, wek ew ji me re axiviye..

Navê Min Xelîl Mihemed Bilal e, vê paşiyê, paşnavê min wek hevalan li min kirin bû "Xemgîn", dibe ku ji xemgîniya ji dengê min derdikeve, bû paşnavê min, li çiyayê Kurmênc "Efrînê" di sala 1957an de li gundê "Çeqela" hatime dinê, gundê me jî mîna hemû gundên Efrînê xemla Rojava ye, ji aliyê xwezaya xwe ve, ji gundekî xizan ji malbateke xizan re çêbûm, min xwendina xwe tewaw nekir, ji ber hîn temenê min 14 sal bû, ez bûme berpirsê malbata xwe, bavê min wek hemû civaka Kurdî ku hinek pere bi wan re çêdibûn ji xwe re jinek din tanîn, û jinek li ser diya min anî, vêce barekî mezin hate li ser milê min. Hîn jî bavê min li ser riwê jiyanê ye, Xwedê temenî wî dirêj bike. Jiber ku bavê min ji xwe hez dikir, û ji jiyanê hez dikir, wisa zilamekî Kurdê kilasîk bû, ji huner û stranê pir hez dikir, yekem Radyo ku kete gund de, bavê min kirîbû, yekem tembûr jî bavê min kirîbû, û wisa ez jî ji guhdariya stranên kilasîk û mûzîka Kurdî di radyoyên Kurdî de, û ji tembûra bavê xwe ez fêrî hunerê bûm, bavê min rê li ber min nedigirt, vê bandor li min kir, xwezaya herema me jî, û şevbuhêrkên gund jî.

Di dibistanê de mamosteyek min hebû Eremenî bû navê wî Necîb bû, ew ji bîra min naçe, di dibistanê de her car ji min re digot stranan bêje dengê te xweş e, -ez jî zarok bûm pir dilşad dibûm wê çaxê-, stranan bêje li dengê xwe miqate be, dengê mîna dengê te kêm in!. Ez ne mîna piraniya hunermendan ku di şahiyan de navdar dibûn, ez di temenekî pir biçûk de çûme leşkeriya Sûriyê, ji ber birayek min ji min bi 4 salan mezintir bû, çaxa ku mir, ez çêbûm bavê min zayîna min û navê min qeyîd nekir, mame li ser wê qeyda birayê xwe, loma jî zû çûme leşkeriyê, di leşkeriya xwe de, min hemû Kurdên Rojava nas kirin, Cezîr, Kobanî, min di wan salên leşkeriyê de zehv xwe bi huner û mûzîkê ve mijûl kir.

Jixwe ji ber ku Efrîn wek nexşeya Kurdistanê dûr dikeve, naskirina pirsa Kurdî ji min re mereq bû, apê min pir bandor li min kir, bandora wî li ser tevgera min, jiyana min, strana min heye! Apê min hişt ku ez têkiliyan bi siyasetê re bikim, di qonaxekê de ez bûme dilxwazê partiya Komonîst. Di sala 1978an de ez çûme welatê Si'ûdiyê, li wir min fikra "PKK" nas kir, hîn "PKK" wek partî jî nehatibû ragihandin, li wir min ji xwe re got, tiştê ku ez lê digeriyam ev bû, û va min dît. Çaxa ku min "PKK" nas kir, ez nefikirîm ku ez ê bibim hunermend, min dixwest wek wan baxivim, wek wan rûnim û rabim, wek cil û bergên wan li xwe bikim!

Li welatê Si'ûdiyê têkiliyên min bi hevalekî "PKK" re çêbûn wek hevalê Husên Yorulmaz, yê ku di sala 1988an de Şehîd bû, min di albuma xwe ya yekem de stranek li ser gotiye, du hevalên din jî hebûn ji Qamişlo, yek Serbestê Mele Reşîd û ê din jî Tacedîn bavê Mezlûm bû, bavê Mazlum ew bixwe jî helbestvanê strana me ya navdar "Vaye PKK rabû" Ye. Hevalê Serbet, heya niha jî di zindanên dagirkerên tirkiyê de ye, hevalê herî zêde zexta çêkirina hunerê û teşwîqa min dikir bû!... Ji wir û bi vê stranê min despê kir, wek min got nedifikirîm bibim stranbêj, min dixwest kêleka xwe bidim kêleka çiyayan, bi şervanan re bim.

Ez yek ji wan kesan im, ku heyranê Seydayê Cegerxwîn im, û yê hişt ku bibim heyranê wî mîrê min yê huner û mûzîkê û hestan nemir Mihemed Şêxo bû, ewqas ez jê hez dikim, û bi deng û mûzîka wî ve girêdayî me, hîç ez nikarim stranek wî jî bêjim û tomar bikim, ji ber Mihemed Şêxo tişteke pîroz e, ez newêrim nêzîkê strana wî bibim. Vêce min hemû dîwanên Seydayê Cegerxwîn xwendine û du dîwan jî min ezber kir bûn "Kî Me Ez?" û "Sewra Azadî". Min carê helbestê Seydayê Cegerxwîn dikirin stran û min tomar dikirn, û êdî me ji rêxistinê re dişandin, û ewan jî ew kasêtên min li nav gel belav dikirin, him ez di hunera xwe de şiyar dibûm, û hin jî hêrsek ji bo şoreşê bû.

Li vir diwazim dîsan bibêjim ku wêje û toreya Kurdî yek ji merqa min bû, min pir dixwend, pir helbest jî min dixwendin, li welatê Si'ûdiyê min kesek Bakistanî nas kir, ew di zanîngeha Al-riyad de dixebitî, di riya wî re min gelek belge û dastanên Kurdî xwendin, dîwana Cizerî, Xanî, Şerefnameya Şerfxanê Bedlîsî.... hemû di erşîfa wê zanîngehê de bûm, ez baş li ser bijartina helbestê disekinîm, dikarim navê hin helbestvanê ku min helbestên wan bijartine bi we re parve bikim, di serî de helbet wê Seydayê Cegerxwîn be, min bi dehan stran ji helbestê wî çêkirine ji wan: "Welatê Min Tiwî Bûka Cîhanê - Ji Bona Her Kesek Yarek - Tû Hatî Nav Şêrîna Min- Hey Lê Hey Lê- Şêrîn Û Çav Reşa Min, Wek Şêran, Hewar Hewar, Ho ho Şivano". û hîn gelek stranên nehatine belavkirin...

Ji helbestên Ebdulla Pêşewî jî min stranek çêkiriye bi navê "Heger Ez Koçerek Bama".

Ji Seydayê Tîrêj re jî mi du stran gotine, yek jiwan "Qurbana Welat im" û "Taca Şerefxanî".

Hebestek Pêt " Feyzulla Haznevi "bi navê Heylê Dayê, di gel hevala me Zozan me xwendî....

Ji helbestvanê nemir Mihemed Elî Hiso re jî min stranek gotiye "Hatî Nivîsandin". Ji helbestvan Ferhadê Içmo re jî" Xwezî Dinya Tim Dinya Ba"! Helbestvanê ku herî min temenê xwe pê re bûrandiye û min dikarî ez helbestên wî bikim stran, û bikevim di bin bandora helbesta wî de, ew helbestvanê hêja Hekîm Sefqan e, ji helbestên wî "Ey Şehîd - Bihna Te Dikim Dayê- Leylê Leylanê...

Roja me- Şengal- Hawar, hawar....". û bi dehan helbestên Hekîm di berhemên min de hene... gelek stranên min, min bi xwe nivîsnadine, hin ji wan stranan weku mînak, strana: "Ez Ne Teyr im, Ne Teyar im" Serê wê helbestê ya heval Şehîd Hamît Avci paşê min lê zêde kir, û bû ew stran!!

Derketina ji welat, bêguman erkdariyek ji damezirandin û xurtkirina sazî û dezgehên me ên çand û hunerê bû!, ji berî derketina min ji welat, gelek caran dîdariyên bi serokatiyê re, ji bo min dibîn bingeha derfet û firehkirina asoyê mirov,... em li ser gelek mijaran daxivîn, carekê ji min pirsî û got: "Di fikra te de Kurd çend melyon in"? Min jê re got Welle serokê min dibêjin di her çar peçeyên Kurdistanê de 40 melyon Kurd hene!. Keniya û got: "Tu dizanî ku ew 40 melyon parçe ne, û tu wek henermendekî dikarî rihê ewan 40 melyonî bi xwe ve girê bidî, û wan 40 melyon parçeyî kêm bikî û bixe parçeyek yan du parçe"!? Mixabin wê demê em baştêne digihiştin wê pirsê, lê belê di berdewamiya tekoşînê de, û di şopandina felsefeya Serokatiyê de, êdî em têgihiştim ku bi rastî em 40 melyon parçe ne!!.

Rêber Apo girîngiyek teybet dida xebatên çand û hunerê, bi zanyarî û nêzîkahiyek fireh, perspektîfên xwe bo xebatên çand û hunerê, mehane, çi bi nivîsandin, çi bi rêya telefonan em agahdar dikirin!... di wan salên destpêkê de, gelekî radîkal bûn!, Rêber Apo pir li hemberî vê sekina me bi perspektîf dixwest em li ser mijara huner û hunermendiyê kûr bibin!, ji me re digot: "Hûn hunermend in, divê hûn bi huner û afrandinê xwe nêzîkê gelê xwe bikin".

"Cara yekem ku ez ê derkevim li ser "Med. TV" bi şêwyek zindî, û hemû gelê Kurd dengê min bike, û min zindî bibîne, ez pir ditirsiyam, hunermendê navdar Xwedê wî bi dilovaniya xwe şad bike, Aramê Dîkarn destê min girtibû, û ji min re digot: Xelîl tu çima dilerizî"? Wisa sawa wê hebû"

31'yek sal in, ku li Ewropa dimînim, hingî bi çand û huner û wêjeya Kurdî ve mijûl bûbûm, ez fêrî zimanê Elmanî nebûme, û nizanim baxivin jî. Berî ez bêm Ewropa bi salekê Koma Berxwedan hatibû damezrandin, Hunerkom saziya me ya çand û hunerê bû, min xebata xwe heya niha jî, di sêwana saziya xwe ya çand û hunerê de berdewam kirî , hetanî vê axavtinê jî ez karê xwe di nava Koma Berxwedan de dikim, em ji kar nawestin, ji ber em ji bo kar hatine vir, her ku li pişt xwe dinerim dizanim ku çiqasî perîşanî heye, çiqasî şehîd hene, di despêkê de ez poşman bûm, min ji serokatiyê re nivîsî ku ez dixwazim vegerim!, ji min re got: Tu çima dixwazî vegerî, ma ka te çi kar kiriye!?" Vê bersivê ez geşbîn kirim û min karê xwe bi coşek mezin şopand. Vê dawiyê "Med.TV" jî ji aliyê havalan ve hat damezrandin, "Med.TV" wek şoreşekî derket, em jî wek hunermend tevlî karê vê telveziyona yekemîn a Kurdî bûm, pir kar û ked dixwest, cara yekem ku ez ê derkevim li ser "Med.TV" bi şêwyek zindî, û hemû gelê Kurd dengê min bike, û min zindî bibîne, ez pir ditirsiyam, hunermendê navdar xwedê wî bi dilovaniya xwe şad bike, Aramê Dîkran destê min girtibû, û ji min re digot Xelîl tu çima dilerizî? Wisa sawa wê hebû, gel li dengê me guhdar dikir, lê em nas nedikirin!.

Di mijara xebata çand û hunerê de, beranberî xeta rêxistinê hin nerînên min cuda hebûm. Anku di sala 1992'an de, weku nakokiyek di derbarê nêzîkahî û şêwaza xebatê de, di navbera xwe û rêxistinê de jiyam!.. bêgumane, di saya felsefe û nêzîkahiyên serakatiyê de, Serokatiyê bi xwe

"Huner û siyaset ji hev qut nabin, lê di heman demê de jî nabe ku siyaset hunerê weku erebeykê an amorek tenê ji bo pêdviyên rojane, nêzîkahiyê li hunerê bike! şêwaza siyasetê ya herî serkeftî, ango çand û hunerê riknê xwe û ê civaka xwe ya herî bingehîn bibîne ye!"!!

û perspektîfên xwe ew pirsgirêk çareser kiribû. dersên min ji wê serdemê girtine jî hene, ezmûn tecrûbeyên hatine qezenc kirin jî bûne para eniya me ya çand û hunerê!... lê belê we pirsiyar kir, ezê jî bi hemu semîmiyeta xwe bêjim: bi rastî ev pirsgirêkên gelekî bi çûk bûn, ji xwe gelek sal di sere bihurîn, di rewşa îroj de, vegotina wan pirsgirêkên biçûk liyaqî gel û asta tekoşînê nabînim!. Lê hun weku rojname û rojnamevan, ez xemxwerî û hesasiyeta we jî fêmdikim! Ji berku li bîra mine, di wan salan de, gelek derdor û xêrnexwezan, li ser wê mijarê didikodî û karê riswakirina kesayeta min kirin! û girêdayî vê yekê, bi fen û derewan xwestin anti propaganda PKK bikin!... Di her rêxistinekê de nakokiyên şêwaz û terzê xebatê çêdibin, helbet ew di saziyan de jî derdikevin.... lê belê ev naye wateya ku nakokî fikrî û ramaniye!... Gelek gotin li ser min hatin gotin, lê ez vegeriyam xebata xwe û ez di sala 1999an de zewicîm, û hetanî vê axeftinê ez karê xwe dikim, û ranawestim.

Piştî 28 salan ku nehatibû Rojava, di sala 2012an de hevala telefona min kirin û gotin, me Rojava rizgar kiriye ma hûn nayên? ez ji eşqa vê mizgêniyê ketim tayê, em girûpek ji hunermendan hatine Rojava, min gelê xwe dît, min temaşe kir ku her tişt bûye bi Kurdî, çaxa ku me deriyê Sêmalak derbas kir û em ketin Rojava de, li wir YPG hebûn, xortekî şervan xwe avêt min ezhimêz kir im ez wê himêza wî ya bi coş ji bîr nakim, ez lerizîm, çavê me tije rondik bûn, ew serdan ji min re xelata herî mezin bû, me çend konsêrt jî lidar xistin, me serdana çiyayê Kurmênc jî kir "Efrîna rengîn" ji ber berî ku ez koçber bibim, min soz dabû wan çiyayan ku ez ê rojekê vegerim û em ê bi hev şad bibim, min piştî ewqas sal dayika xwe jî dît, lê mixabin ez tenê 18 se'etan li Efrînê mam, em mecbûr bûn vegein Dêrka Hemko, ji bo ahenga mezin lidar bixin hatina min ji bo Rojava "Nobila" min e!. Em ji bo vî gelî derketin rê, emê bi vî gelî re bimeşin, li kîderê pêdivî hebe, em herdemê amedene bo xizmeta gelê xwe!... ji xwe ez li ser karê xwe yê hunerî disekinim, her û her jî mijûl im, staylê min heye, û gel fêrî staylê Xelîl Xemgîn bûye.

Ez pir giraniyê didim strana li ser şehîdan.. Min ji sala 2008an ve album belav nekirine, ji bo berhem û albuma nuh, xebatên bi rêk û pêk min destpêkirî, bi hêvîme, di sala 2017 de, ezê bi derfetên xwe şexsî bikaribim berhemek nuh diyarî gelê xwe bikim!...

Albumên min ev in:

"Bagok" 1988 - "Ey Şehîd" 1992 - "Name" 1996 - "Zend" 2004 - "Ax" 2008. Ev berhemên min yên taybet in, ji bilî stranên min di koma Berxwedan û ên hevalan strane de.

Hêvîdarim li gora pirsên we, min rastiya X. Xemgîn anî be ziman, min dilê xwe ji we re vekir, wek jiyana zehmetî ya ku min jiyan kiriye, di strana xwe de, herdem min hewildaye ku coş û fikirandin hebe, ger wisa hin caran bi şêwaza xemgînî be jî, dixwazim hunereke pêşketî diyarî gelê xwe bikim, di vir de jî ez bi zelalî axivîm, ji ber ku wê hinek min bixwînin, û bila xweş min nas bikin jî ka wan ez çawa di serê xwe de ava kirime, wek ku min Mihemed Şêxo ji xwe re kiriye mîrê xwe, lê ez wî nas nakim, (tenê sala 1985an, bi qedera çend saatan ez bi wî nemirî re axivîme...) tenê lê guhdar dikim. Çaxa ku tenê dimînim li Mihemed Şêxo, Hesenê Cizîrî, M.Arif, Eyşe Şan, Erdewan Zaxoyî... û dengbêjên me guhdar dikim, ew hunera resen didin min, ji nifşê nû jî, li hin dengan guhdar dikim, gelek deng û hunermendên hêja, bi bandora Koma berxwedan derketin, dengê Jina Kurd, şopdarên Meyremxan û Eyşe Şanê gelekî xweşin, lê mixabin, îroj gelekî kêm in!, yek ji hêvî û bendewariyên min ew e, ku Jina Kurd, weku di tekoşînê û cengê de bûye qehreman, her wisa di strana resen de jî derkeve pêş!... Ev bû 41 sal ez stranê dibêjim hîn jî min jixwe re negotiye ez hunermend im. Şîreta min ji nifşê nû re berê xwe û hunermedîtiya bi helwest, di milê fikir û bingehê de, xwe baş perwerde bikin! Nasnameya Hunermend civak dide hunermed, pîvana civakê, ya herî resene! strana resen e, wê stranê bêjin û lê miqate bin.

Ez wek stranbêjekî ji xwe neaciz im, hunera Şanoyê gelekî hezdikim, lê karektera min û şanogeriyê gelekî ji hev cudane! Her wisa di dawiya vê axavtina min bi rojnameya we Bûyerpress re, dixwazim spasiya we bikim, û di riya we re silavan li gelê Rojava bikim, û ew her sê gulê ku hûn dixwazin ku her gulekê bidim kesayetekî, ez ê gula yekem bibim helbestvanê hêja hevalê min Hekîm Sefqan, a duyem bidim nivîskarê hêja Helîm Yûsiv, û ya sêyem bidim tekoşîna jina Kurd bi taybet jina "YPJ" e. Û ji min jî gulek ji bo we û keda we.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App 00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Şewata Sînema Amûdê,Birîneke Hîn Nehatiye hev.

Di 13 – 11 – 2016 ê de, me (56) mûm li ser Girê Şermola vêxistin, da ku em gorên zarokê xwe yên ku bê sûc û guneh bi agirê Sînema malmîrat hatin sotin, ronî bikin û ji wan re bêjin, ev roniya azadiyê ye, îro çirûska wê li Amûdê vedide, bê guman e, wê li seranserî sûryê û devera rojhilata navîn jî vede.

Azadiya ku di biçûkaniya xwe de, we barê wê hilgirt, hun tiyê wê bûn.

Bi tenê gunehê we, piştgîriya azdiya gelan bû, tenê hun dildarê peyva (AZADÎ) bûn, dildarê hezkirina pêkvejiyana azadiyê bi pîlan û dav e, ta ku agir serê xwe li we hilda, win dorpêç kilin, îdî deriyê mezin nema têra we dikir, hinan ji we xwe di pencerê re avêt, mixabin bîra rûreş li xwarê li benda we bû, ta hawar hawar, bîna kizîra cendekên we yê rexil û nazik bi ser bajêr ket, ta jin kalmêr bi hawara we ve hatin, mêrxasiyeke bê hempa ji bo rihakirina we kirin, mîna Mihemedê Axê, ku bi wêrekî xwe li nav êgir dixist û zarok riha dikirin, dora (11) zarokan riha kirin, dengek kete guhê wî: vegere va kurê te riha bû, lê vegerand: Ev hemû zarokên min in, û bi pêş de çû, ta ku demirê hesin yê nava sînemê bi ser de hate xwar, û jiyana xwe ji dest da.

Ev mêrxasî diyar dike, eger ku dilê mirov ser zarokê cîranan nêşe, dê dilê wî li ser zarokê wî jî neêşe.

Bê guman e, ku Amûdê, weke bajar, her dem qelenê qehremanî, kurdperwerî û dilsoziya xwe dide.

Em tev dizanin ku Amûdê bû di sala 1937 an de bi balafirên firansî hate şewtandin, komela ciwanên kurd li Amûdê bi alîkariya Seydayê Cegerxwîn û hevalên serdema wî hate avakirin, komela alîkariya belengazên kurd damezrandina wê ji bajarê Amûdê dest pê kir, pişkdariya bajarê Amûdê di serhildana Qamişlo di 2004an û şoreşa sûryê de di 2011 ê de berçav û xuya ye.

Tevî van jî, şewata sînemê,

birêneke kûr e, hîn nehatiye hev, û daxeke reş e dê di eniya nijadperistan de bimîne.

Jineke Laşqot, Zevîyeke Himbiz û Bijûn e

Li gel ku roman di vê qonaxa wêjeyî de di pila yekem de cî digre, lê çîrok dimîne beşê herî balkêş ê tabloya wêjeyî, ji ber ku tîrbûn û herikîna ramanan di vî beşî de belîtir û berbiçavtir e.

Berhevoka kurteçîrokan a bi navê "Jineke Laşqot" li ser hîmê nivîseke kubar ava bûye û bi ximava hestan hatiye meyandin. Xwînerên xwe di zevîyeke fireh û bijûn de dibezîne û di gera sawêran de mest dihêle. Ew her wisa di valahîya kesane de hûrgiliyên jiyanê wekî kulmek ava kaniyan bi wan dide vexwarin.

Reng e ku çîrok dengekî cihêwaz ê bi hest, helwest û ramyariyeke taybetmend a lêgerîna dadmendiyê ye, her wisa dibe ku ew dengê taybetmendiya jiyana kesane be.

Ebas Mûsa di bîst û du kurteçîrokan de xwînerên xwe li hespê jiyanê siwar dike û wekî geştyar û şopgerekî, şêwe û xweşikiya jiyanê di qonaxên ceng, aramî, zaroktî û tenêtiyê de raberî wan dike. Bûyer kêlî bi kîlî bi zimanekî şayîk û hostane hûnandine û zeviya çîrokên xwe bi comerdî tov kiriye.

Di vê pirtûkê de, nivîskar hewl daye ku bi zimanê piraniya akterên jiyanê biaxive û hestên nazik ên têvelî azardarî, jankêşî û xweragirIyê di parzûna peyvan de dawerivandine, wekî ku di çîroka bi navê "Termê Min Li Wir Nehêlin" de gurzek nameyên derbarê xweragirî, dilsozî, cengewarî û xwegirêdana bi waran ve dighîne xwînerên xwe.

Wekî din, çîroknivîs Ebas Mûsa sînorê çanda herêmî bi tîrbûna çirûskên ramanan û himbiziya mebestan darbas kiriye, ku ev yek di çîroka bi navê "Pirtûka Miriyan" de diyar dibe.



"Jineke Laşqot" xwîneran di kûrahîya dozên kevnar de binav dike û bûyeran bi hûrgilî şirove dike. Nivîskarê pirtûkê rewşa mirovahiyê di vê qonaxê de li ser du celeban dabeş kiriye:

Celebek li qata jor dijî û celebê din li qata jêr dijî;

Malva Elî

ev yek di çîroka bi navê "ŞÎN"ê de diyar dibe û nivîskar bi xweşbêjî vedibêje bê çawa lehengê çîrokê tenê dengê terqterqa pêlavan dibihîze û ji nişka ve li xwe dinêre û jiyana xwe li gor rûberê odeya xwe dipîve.

Di her berhemeke wêjeyî de pîvan û nêrînên taybet hene ku li gor lêvegera ramyarî û wêjeyî ya her nivîskarekî û her wisa li gor taybetmendîya azmûna wî ya mirovane hatine danîn û rûniştandin, lê Ebas Mûsa ev dîwar bi temamî di vê pirtûkê de herifandine û tenê ji bo wêjeyê nivîsîye.

Wekî xala dawî jî, li gel ku ev pirtûk ji zimanê Erebî hatiye wergerandin lê nivîskar û wergêr Evdo Şêxo keziyên Jineke Laşqot bi hostayî hûnandine û kiras û xeftanê Kurdiyê bi qasî bedewî û bilindiya bejna wê dirûtiye.

Tirsa Zarokan.. Sedem û Çareserî

Ji Erebî: Bûyerpress

Tirs tiştekî xwezayî de ku hindirê mirovan de ji dema ku tê dinyayê çandî ye, ew jî bi xwe du-alî ye, bi sûd û ziyan e, kengî vê tirsê pileya xwezayî derbas kir dibe nexweşî, û gereke zû bi zû were dermankirin.

Ji van tirsan, tirsa zarokan ku bi gelek sedem û egeran ve girêdayî ye, ji wan:

- Delalîkirina zêde ji hêla dê û bavan, yan jî rexnekirina tûj û berdewam.
- Helwestên ne xweş ku zarok di biçûkaniya xwe de tê re derbas dibe, û di mejiyê wî de tê çandin, û nema dikare zû bi zû jê rzgar bibe.
- Nakokiyên malbatî ku di navbera dê û bav de bi taybet.
- Carnan zarok tirsê bikar tînin ta ku bandora xwe li derdorê bike û guhdan pê çêbibe.
- lawazbûna laş û derûnî, dihêle ku zarok ji derdorê bitirsin.

- Tirsandina zarokan, ji ber zarok xeyala wan fireh e, û çi jê re were gotin bawer dike.

Cureyin Taybet Ji Tirsê û Awayî Têkbirina Wan

Tirsa Ji Tarîtiyê: Ev tirseke normal eli gel biçûk û mezinan. Pisporên derûnî dibêjin ku Tilvizyon sedemên sereke ji tirsa zarokan re ne, û dê bav nizanin ku ta çi astê ziyana wan li derûna zarokan heye.

Tirsa ji Ajalan: Ev cureyê Tirsê taybet bo zarokê 2-4 salî ne, û ne şert e ku zarok bûyerek pê re li gel ajalan çêbûbe, lê ew qonaxeke zarok tê re derbas dibe. Di vir de dive nêzakatiyek di navbera zarok û ajalan de hebe, û ev yek ji dê û bavan bêtir tê

xwestin.

Tirsa Ji Mirinê: Ev qonax jî normal e, ta li gel mezinan jî peyda dibe, sedem jî ew e, rewşa taybet ku bi mirinê re mîna girî û hawarkirin çêdibe.

Çareserkirina Vê Diyardeyê:

- Divê ku dê û bav li pêş zarokan nimûneyê hedanîû aramiyê bin. Rewşa mal bêdengî lê hebe, eger kur tirsiya dive di ber dilê wî de bidin, ne wî bêtir bitirsînin, jê re diyar bikin ku ew alîkar in.
- Hewl bidin ku hun pirsgirêka mirinê bi zarokan guftugo bikin, bi awayekî hêsan û zelal rastiya mirinê ji zarokan re diyar bikin, û kesê ku dimre dice bihuştê, bihuşt pir xweş e, her tişt lê heye, û dive di heman demê behsa dojehê qet nebe.
- Nabe ku tiştê merov jê bitirse , li pêş zarokan wê tirsê diyar bike, ta ku ew jî netirse.
- Divê dê û bav hewl bidin ku asta tirsê li gel zarokan kêm bikin, eger zarok ji tarîtiyê ditirse, divê yek ji wan re çend rojan pê re xew bike, roj bi roj çira odeya zarok kêm bike, ta ku fêrî tarîtiyê bibe.
- ta ku asta tirsê li gel zarokan kêm bibe, dibe merov wî fêrî hindek "Du`a" yan gotin bike, wek mînak; Ez Xurt im, Xwedê Bi Min re Ye, Qîraneke Wê Derbas Bibe..HTD.
- Nabe merov bi tirsa zarokan bikene, dibe ew bibe sedem ku zarok di pêşerojê de tirsa xwe veşêrin û pirsgirêk mezintir bibe.
- Nabe merov zarokan mecbû bike ku bi tena xwe di tariyê de rûnên, ev tirsê xurtir dike.
- Divê merov zarokên xwe fêrî wêrekiyê bike, û merov ji ber tirsa wan şerm û fedî neke.

Di dawî de, nabe zarok ji dûbarekirina tirsa xwe , nas bike ku dê û bavê bêhêvî bûne, yan ji ji vî tiştî aciz dibin, vajî vê yekê, divê hasten aramiyê tê de biçînin, destê wî bigrin, û wî bigrin ta karibin wî ji vê nexweşiyê rizgar bikin. Eger zarok aramiyê li gel dê û bavan û di nav malbatê de nebîne , tekez ew li tu deverên dî nabîne.

www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Mihemed Xêr Umer.. Berhemin Bijartî

Mihemed Xêr Umer.. Di sala 1972an de li taxa Hilêliyê , li bajarê Qamişlo jidayik bûye.
Xwendina xwe ya seretayî li taxa xwe qedand , û zimanê Kurdî li ser destê mamoste Ferhadê Çelebî fêr bûye.

Helbestin hayko

Werger :Mihemed Xêr Umer
1
Golek kevnar
Beqkê biçûk xwe çem kir
Buqîna avê
*başo
2
Wek sitêr zanekî
Li ezman dinere
Beq
*êysa
3
Ez biçinim
Ez neçinim
Ev kulîlka biçûk ?
*naw
4
Dengê tava ji dûr
Çêlekin bizdhayî
Bihevre li malekê digerin
*nenas
5
Dengê min limin vedgere
Bi baya xurt re.
*maystso
6
Li koxika min
Tiştê ku dikarim ez
Pêşkêşî tekim
Ewe mêş biçûkin
*başo

Bê Denga

Çîrok: zekeriya tamir
Werger: Mihemed Xêr Umer

Zihêr sebrî bi jineke mîna gulek sor li ser şaxekî kesk civiya, wê jê re got bi dengekî lerzok ku ew jê hez dike û nikare ji bilî wî hez bike , wî jê re got: Ew guh nade ji bilî pêşeroja xwe ..veciniqî bi sîlek tûj daweşiya qemçka wî, li dora xwe zîvirî, lê ti kes nedî, û carekê din sîlek lê ket dema ji yekî dewlemend re got: Ew mêreke gewre ye wek wî çênebûne li ti welatan .. û yê sîl lêxist nedî , û cara siyem sîlek xwar dema birêzdarî destê mirovekî rih dirêjî gijok ramûsand û lavêjî wî bû ku dûa jê re bike, û yê sîl lêxist nedî ..

Û gelekî û her roj zihêr sebrî sîl dixwarin lê bêyî ku ew kesê nepen û nexuyayî ku sîla lê dixe bibîne .. û ji ti kesî re nediaxivî ser van sîla .. ta kes henkê xwe bê neke û wî tewanbar neke bi dîn bûnê ..
Lê ew bawer bû ku her kes mîna wî sîla dixwin lê xwe bêdeng û ker dikin .

Şehnaz

Şehnaz , xwedya herdû çavên xweşik , dev li ken diçe ser karê xwe .. tevî ku mûçê wê dike ku têra her pênc kufletên mala wê yî biçû bike .. û wiha ye jî li ser kar .. dev li kene .. ti wêna nabîne bê mad û ingirî .. lê belê ew kurte demên ku têde di pûnije .. besin ku kulên wêyî giran di kûrahiya hinavê wêde bide xwiyanîkirin .

Di destpêka havînê de , û ew li mala kalkê xwe , xebera mirna diya wê yî ji nişkêve .. bihîst , weke birûskikê lêket ..! bê hiş hate xwar .. û bê hiş diaxivî û destê xwe dirêj dikir û bi gazî digot :

- ew .. we .. diya mine … ji bo xwedê wê nebin .. naa ..

û keserên lerzok vedidan .. û rûwê xweyî şil bi herdû destên xwe vedişart .. û helkhelk pêdiket ta careke din ji hişê xwe diçû ..

Piştî heftîkê vegerya mal , derbasî nav zarokan bû bi cansivikya xweyî berê .. macî wan dikir pore wan bi henekî dikşand , û li rewşa wan dipirsî .. û bi ken ji herdû xuşkên xwe dipirsî :

- gulê .. dilo .. ka em bibînin bê we çi xwarin ji mere çê kiriye ..

Piştî çend rojan , û dema ku firavîn dixwarin .. şehnaz qedehên çayê dadigirtin ji birayên xwere got :

- kamîran , ehmed , ronî .. tenê pêşinyare .. tenê çi ? biken ji wan pirsî .

- tenê pêşinyare .. biken bersiv dan ..

Û dev li ken berdewam kir :

- hûn apê Osman nasdikin , xwedyê firnê .. min jêre got bo hûn li ba kar bikin .. û ji sibe sibehê de .. hûnê (gato) ji ba wî bibin ..

Bi coşekî mezin gotina wê birîn : erê .. erê .. bera ..

Şehnaz dîsa berdewam kir û got :

- emê mûcê we hilînin ji bo pêdiviyên dibistana we .. û dûvra ez soz didim we ku her tiştên hûn bixwazin ezê ji were bikirim … ronî rabû û got :

- tê sozê bidi min ku tê topekê cerm ji min re bikire ?

- ez sozê didim te , bes ku niha ti rabe şanî meke bê sibe tê çawa kar bike .

Ronî daqûl bû û rahişte sênîkikê .. û çû û hat di nav xuşk û birayên xwede yên ku bibû tîqtîqa kenê wan dema ronî bang dikir :

- gato .. gato cozilhind .. germ û nerm ..

Û mîna her şev , û piştî rêzefilimê tilfizyonê , kehrebê vedimrînin .. û diçin ser livînên xweyî raxistî li sre dika hewşê li bin dara hinara ..

Şehnaz xwe diber xwişk û birayên xwede bi kêlekikê dirêj dike .. û dev li ken bi wan re diaxive .. berî dest bi lîstika xweyî her şev (xwarna sêva) bikin :

- ji îro pêde (xwarna sêva) ne tenê tê bi wata ti pêkenokikê bêje … na .. tikare pêkenokikê yan jî bûyerik bitere çê bûbe li ser kar ..

Kamîran destê xwe hilda û bişadî got :

- naxwe îşev ezê sê sêva bixwim ..

Bi coş ronî got û girnijînikê xwe li rodêmên wî veda bû :

- ê min ezê îşev çar sêva bixum ..

Û wiha di rewşek kêf û şadîde .. şehnaz li hêviya xwişk û birayên xwe dimîne ta sêvên xwe dixun , û hêdî hêdî dixewre diçin .. û dema tekez dibe ku dixewre çûne ..

Li ezmanê bilind û bi rihniya heyvê ronî bûye … dinere .. û bêdeng û bişewat .. digrî .. digrî ..

Ta ku zimanê xwe yê Kurdî xurtir bike, dest bi wergera ji zimanê Erebî bo Kurdî kir. Û berhemên xwe di gelek kovar û rojnameyan de weşand.

şikeft

çîrok : Arif Alxetîb
werger : Mihemed Xêr Umer

li çol û bêlana geriyam , bi tenê derbider , pir westiyam û nexweş û bêzar bûm …

gihştim bajarekî nûjen . neşteciyên wî mirovin mîna min bûn .

daketim nav wan , û li rûdêmên wanî geş temaşekir .. li min hayil nebûn û bi hêla min de nezîvirîn !
biyaniyê tenazî bi min kir … û ez xemgîn bûm .

westiyam û ji piyan ketm .. û li ser rexrêka hişk hatme xwar .. hestiyên min yên pûç û lawaz derizîn .. ez zariyam : - Ax .. Ax ..

biraderên min xwe ker û bê deng kirin , û bilez hatûçûna xwe berdewam dikirin di nik min re ..

min hêza xwe ya mayî da hev û bigiranî rabûm ji bajarê nûjen bi rûsarî vekişyam .. û min li şikeftek li nav tehta xwe girt , û bêcare min xwe lê dirêjkir , û min keserek veda : - Ax .. Ax ..

şikeftê keser veda : - Ax .. Ax .. gelek kêf xweş bûm bi vê sehkirinê !! min pala xwe da tehta dilovan ... tik-tika dilê wêyî nazik dihate min .. êş û xemên xwe min ji bîr kirin , û min çavên xwe dane ser hev û dilşad razam .

Berhevokek wî ya çîrokan bi navê "Li Ser Min Diaxivin" heye, di sala 2012an de li Dar Be`il hate çapkirin. Mijarên wê civakî û evînî ne.

Bazar

dawî û piştî kezeb reşîkê zor .. me karî bû kalkê xwe bînin ser rê :

- ti li wê dûra hane .. xwedê nekê ti nexeş bikeve .. yan jî ti di nav livînê xwede bimre kesek ji me bi te nabihîze ..

¬- xanyê me mezine , û zarok xulam û xizmet karin li ber destê tene .. û ode pirin .. ya herî xweş emê ji tere vala bikin ..

- perê xanyê te emê pê karekî bikin ku em ji tere tiştekî jê wergirînin …

- ava germ .. ava sar .. û mizgeft di bin çengê tedeye .. kengî ti bixwaze ti herê tê herê ..

hima ku kalkê me serê xwe bi erê hejand , hejandinek nejidil , ta qerebalixek bi malê ket , qerebalixek bê deng , û her yek ji hêla xwe bela bû ku firotina xanî ragihîne û binav bike ..

gelek bitirs min firçe û qutîka boyaxê ji zirêdiyê derxist .. û bi tirs û dizî ji mal derketim da ez pêl hestên kalkê xwe nekim yê ku bihêla mala xwe ve diçû mîna mozekê sorî ingirî ...

bilez ez bi ber mala hevalê xwe mamosta xemgîn de çûm li ser daxwaza bavê xwe yî berê .. û çawa min jê daxwaz kir ku bê û li ser xaniyê kalkê min bi xeta xweyî xweşik binivîse (ev mal ji firotinê reye) ta rûdêmên wî li hev ket , û dev herbilî ji min pirsî :

- kîjan xanî ? .. li kure ? .. çi bihayê wiye ? .. belkî ez .. ez belkî bikirim .

Rûdêmên mamosta geş dibû dema em derbas dibûn tarên dûr û nexweş .. , û bêhna wî fireh dibû dema em derbas dibûn zaboqên tengî bi toz ku bêhna pez û sewala jê dihat .. çimkî behweriya wî bi karîn û hêza wîya kirînê çê û mezin dibû .. û xayiz çûbû û pênc li şeşa dixist

- dawya vê mehê ezê perê xanyê ku ez têde ezê bistînim .. û xemasa zêr ya ca zaroka .. û ew çend qirûşkên ku min hilanîne .. û .. ew .. .

Li dawiya bajar û li pişt wê

giropana tijî komên zibalê û bermayên xaniyên ku têne xerakirin û ji nûvre avadibin .. û li binya wî qelaçê biçûk xanyê kalkê min bû .. yê ku em liber deryê wîyî depkî xwar bûyî gihanê .. û dev liken rabû pêşwazya me kir .. piştî min diguhê wîde got bi dengekî nizm ku mamosta hatiye xaniyê wî bazar bike .. û derîyê depî xwar bûyî li pêşya me dehif da ta ku zîqzîqa wî gez me neke û xêrhatin di mede da û got :

- ehlen wesehlen .. ser çava hûn hatin .. fermo .. derbasbin ..

Lê mamosta zû dest pêkir û got :

- apo … divê berî her tiştî ti bihayê xanî ji min re bêje .. ta ez zanibim .. hêz û karînên min dighêje kirînê yan na ..

Çawa apo bihayê xanî got .. ta fîkandinek matmayînê dirêj ji ber devê mamosta çû .. lê zû li zûkirina xwe hayil bû .. û dicî de girnijînik li ser rûdêmên xwe belav kir ta amûjên matmayînê li ser veşêre û binermayî got ji kalkê min re yê ku gotina xwe bi zarekî pirotistoy berdewam kir :

- xanyê min pel û belgên wî bifermî hatine çêkirin û ew di hindirê pirojeya bajêr deye ..

Bi rûkî sor mamosta gotina wî birî :

- lê ya apo .. bi vî bûhayê ku ti dixwaze xanîk li nîvê bajar pê tê kirîn ! û dûvre xanyê te nejbilî odek û kozikek biçûkî herifî ye ..

Rûdêmên kalkê min li binguhên hev ketin dema ev sehkir (odek .. û kozikek biçûkî herifîye) rabû daw û delingê xwe hilda .. û biqehir sê gavên bipîvana hev radan û li paş kozika biçûk rawistiya û bi livandina destê xwe jêre şirove kir :

- eh livir ku ti odakê ava bike wê xaniyê te bibe di ode û eywaneke fireh .

Mamoste diber xwede girnijî .. û berî bipeyive , kalkê min berdewam kir :

- ji xwe ku te ode bi stûnên ji çemento rakirin , wê çaxê ti kari qatekê dî liser ava bike .. wê hingê wê bayê dehla hilêlîkê li wade ê ku di belkona wêde rûnê , û hilma mêrga hilko wê biserde bifûre ..

Mamosta hew karîbû xwe bigirta , bangkir : apo .. apo

Lê apo goh nedayê , jiber ku mijûl bû bi avakirna qata sisya :

- ku ti textê xweyî razanê derxîne ser qata sisya … ho.. hoo..ho .. ma zozanê şerfdînê li ber çiye ..?! wê heta deşta çirkînê ji te xuyabe !

Mamoste destê xwe xist qirka kalkê min de û biqehir ew hejand :

- apo .. apo o .. kalkê min wek yekî nû bê ser hişê xwe lê nerî .. mamosta destê xwe bi hêla odê vekir û bi qîrînî got : anha ji bilî vê qulikê tiştikî te heye ku tê bifroşe min ?!! û bi lez derket .. deryê depî ku xwar bibû bi terqînî li dûv xwe girt .. û çû ..

kalkê min bi xemsarî ji qata sisya bi dûde hate xwar .. û bi şermî li dora xwe zîvirî û deng jikestî bang li mamosta kir :

- min gooo .. otostiradek mezin heye wê di vêderê re .. di ber xanî re derbasbibe haaaa ..



www.buyerpress.com
buyerpress buyerpress1
buyerpresss@gmail.com
Whats App00963992238683
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Ji Filklorê Kurdî.. Çingîna Tasê

Rojekê civata mîrê Botan geriya bû, ji wezîrê xwe re got: Rabe tasek av bide min. Wezîr rabû tasek av jê re anî, berî tasê bigihîne destê mîr ji fedya tas ji dest wezîr ket.

Çingîn jê hat. Ava tê de li dîwanê belav bû. Mîr gelekî qehirî, ji wezîr re got: Dema çingîn ji tasê hat çi got?!. Wezîr got: Mîrê min ma ez ji ku zanim çi got. Mîr got: Ez bi eniya bavê xwe kim ji niha heya sibehê ko tu ji min re nebêjî vê tasê çi got ez ê serê te jêbikim.

Wezîr dilbixem hat mal keça wî dît ko bavê wê gelek dipojine. Li cem rûnişt û got: Bavo ma te xêr e, çima dipojinî?.

Wezîr mesela xwe û mîr û tasê jê re got. Keçikê got: Yabo, ez ê çingîna tasê ji te re bêjim. Wezîr got: Ka bêje keça min. Keça wî got: Dema çingîn ji tasê hat got: Ez berê kulmek ax bûm, hoste ez anîm kirim nav avê û di firnê de ez kelandim, heya bûm wek qeymaxê li ser avê baş dam hev, ez li ber bayê cemidandim, heya ko sar bûm. Ez kirim wek gilok. Ez kirim devê matê û ez kirim kûra agir, heya sor bûm. Ez danîm ser sindanê û ez çep û rast qulipandim, hin bi hinik ez tenik kirim, heya ez kirim vî qalibî. Paşê ez bi ava zîv û zêr kildam, ta ko ez ketim vî rengê xweşik.

Ji ber vê yekê tu dibînî nuh ez ketim ser destê hakim û wezîran û ez ketim ser dev û lêvên wan.

Sibehî wezîr hat dîwanê û wisa ji mîr re got. Mîr got: Rast e. Lê kê ji te re got?. Wezîr got: Mîrê min keça min gotiye. Mîr rabû ew keçik ji kurê xwe re xwest û anî.

Herwekî Tîrêj gotiye:

Heya tu pir newestî der xebatê
Tu naghêjî tu daxwaza birader
Bi te‹bê tu dibî zana û xwenda
Xwe dighînî civata şah û Qeyser.

Mamik
Tiştek heye: Sê ling, sê dar.. Çar ling pê da.. Duling hat û himik lê da.

Zûbêj
Heft ser re û heft ber re
Û heft jî ji xwe û me re
Hê nû here milek giya bîne
Ji ker û golikê xwe re

Kurdî xweş e

Endeziyarî	هندسة
Mîratgir	الوارث
Xweparêzî	وقاية
Sebaret	بالنسبة – بخصوص
Pakane	براءة
Hogirî – Aşnabûn	تآلف
Hogir	مرافق – نصير
Paşbendî	تبعية
Nûjenkirin	تجديد – تحديث
Xwelibergirtin	تحمّل
Terxankirin	تخصيص – تكريس
Kedîkirin	تدجين
Dudilî	تردد
Tomarkirin	تسجيل

Tu çi Ji Min î.. Bi Xwe Dikarim.. Nikarim

Hezret heye; lawê mala Beyarê, Layê Kalê, Hîn zaro ye. Ew dev ji min bernade. Min dît, dibêje Xalê Şêxo!

Min got: Çi ye, kuro.

Dibêje: Tu çilo bi xwe dikarî.

Min got: Lawo, dewlet serê xwedê û pîrika te ma li xwe diheyirim.

Pîrika wî, Wetha ye, Dibêje `Yeh! Ocaxê te ne ava.

Ocaxê min!? –Tu li pey çi yî? Tu zarok î. Te çi ji min î, bi xwe dikarim nikarim; kûçik lawê kûçik!?

***

Ken Bi Kurdi Xweş e

Di Fatimê De Xweş e

Em li qehwê bûn; elektrîk vemirt. Navê qîza min Reşê ye. Îca elektrîk vemirt –şeytan in- li qehwê. Min got: Lawo bû reş.

Min dît dibêje: Xalo di Reşê de xweştir e!

- bi mane got ma?

- Şeytan in kuro! Gênco!

Min got: Na lawo, wele di Fatimê de xweştir e!

Fatimê ciya wî bû!

xaçerêz

ASOYÎ:

1. Ji bo bersivê, xortê biçûk.
2. Cureyekî tilûran (vajî), xanî.
3. Gotinên veşartî, daçek (vajî).
4. Ji bo pirsa kes, jêdereke avê ye (vajî).
5. Ji nîşankirina nêzîk, hejmarek e.
6. Gulistana mîrê botan, tayên pîrepîrê.
7. Rêxistineke siyasî, ji bo erêkirinê (bi zimanekî biyan).
8. Xeyala ku li ber roniyê çêdibe(vajî), komek sewal (vajî).

STÛNÎ:

1. Temen mezin.
2. Lehengê dîrokî yê kurdan (vajî), Tiştê ne germ be (vajî).
3. Cînava kesê yekem, temen (bi erebî).
4. Wekhev, cînaveke nîşankirinê tewandî(vajî), bê av.
5. Bo gelekjimara lîkeran, çekeke cengê kevnar.
6. Tiştê her roj dibe.
7. Daçek (vajî), cureyeke tilûran.
8. Ji pêkhatên çîrokê, hinek (bê dengdêr).

Bersiva mamikan hejmara 53an (Pişkul - Petêx)

Bersiva peyva wendayî ya hejmara 53an (çarçira) ye

Peyva Wendayî

Xwendin nebî kes naçe pêş
Peyda dibin pir derd û êş
Herdem di bin destê neyar
Em dê bidin.....
Peyva wendayî 9 tîp in, navê afrênerê vê helbestê ye.

Pendên Kurdî

Aqilê xelkê hingilê meşkê
- Xezûrê bûkan serê sûkan
- Erê reşe lê mewîjek xweşe
- Bilûra ber ga ye, çira ber kwîra ye
- Margestî ji xuşina werîs ditirsî
- Bext reş li emir kina rast tên
- Fira mirîşkê kadîn e.
- Beza pisîkê kulîne
- Kevrê havîna bavê bin kulîna
Dizê bistana xuya dibin zivistana

N	P	Ê	Ş	P	I	R	C	K
E	D	I	B	I	N	Ê	Ş	E
B	D	E	S	T	Ê	E	D	S
Î	Û	G	D	Ê	E	R	I	P
X	W	B	I	D	I	N	B	E
E	M	R	A	Y	E	N	I	Y
H	E	R	D	E	M	Î	N	D
N	A	Ç	E	D	E	R	D	A
X	W	E	N	D	I	N	N	?

	1	2	3	4	5	6	7	8
1	H	E	M	E	D	A	N	Î
2	E	H	■	R	O	V	Î	■
3	S	M	I	D	■	A	V	Î
4	K	E	L	E	H	■	R	R
5	I	D	■	Ş	Ê	X	O	■
6	R	■	K	Ê	L	E	■	Î
7	I	N	■	R	A	M	A	N
8	N	A	N	■	N	■	V	Î

	1	2	3	4	5	6	7	8
1			■					
2	■				■			
3				■			■	
4			■					■
5		■			■			
6				■				
7						■		
8			■					■